

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ

*Xebat ji bo* :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.



Osman Sebrî
1905 - 1993

*Ji weşanên* Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

*Hejmar ( 122)* *Sal 21* *Gelawêj 2016 z - 2628 k* *Buha (75)L.S*


# Ji Kurdan re! ... Yek Dest û Yek helwest!



" Xelkê Munbicê ji Dai'ş ê rizgar bûn "

**Desteya sernivîser**

Piştî ku Encumena Leşgerî ya Minbicê, bi alîkariya Hêzên Sûrya Demokrat HSD û Hevbendiya Navdewletî, bajarê Minbic û derdora wê ji hêzên Dewleta Îsalmî(Daiş) rizgar kirin, Erdoxanê ``birîndar``, û wekî ku (marekî pê dada), li roja 24ê miha Gelewêjê, bi dehan tang, ligel hezaran leşgerên tirk û hin çekdarên tundrew yên rikberiya Sûrî, di sînorê Sûryê derbas navça Cerablusa Sûrî kirin. Behaneya Erdoxan û berpirsiyarên deslata tirkiyê ew bû, ku şerê têrorê bike û hezên wê ji ser sînorê tirkiyê rake.

Lêbelê tiştê syer û balkêş ew bû, ku rêzdar Erdoxan, rêxistina Daiş û Yekîneyên Parastina Gel di bin yek navnîşana ……….2

## Şêx AlÎ: Lihevkirina Tirkiyê û Amerîka…



Serkretrê partiya El-wehdê Şêx AlÎ di hevpeyvînekê de ligel Qasiyûn news got ku: “Destêwerdan û dagîrkirina ordiya Tirkiyê ji bajarê Cerablusê re rûpeleke nû di kirîza sûriyê de vedike”

Şêx Alî weha domand: ” Dagîrkirina Tirkiyê ji bajarê Cerablusê re li gor hemî zagon û urfên navdewletî cihê şermezarî û rûreşiyê ye ji ber ku Cerablus bajarekî sûrî ye”.

Sekreterê El-Wehdê amajer bi wê yekê kir ku:” Aramanca Tirkiyê ji vê gavê ew e ku karibe rolekê di pirsa Helebê de bilîze, û Armenca serke ya Tirkiyê bi vê destêwerdanê dorpêçkirina kurda û rêtengkirin li ber hêzên YPGê û YPJê ye”.

Di berdewamiya axaftina xwe de Serkretrê partiya El-wehdê Şêx AlÎ got:” Herweha Tirkiyê dixwaze destekê bide hêzên cîhadîst û temenê …2

## Hevpyvîneke taybet bi berdevkê fermî û berpirsê pêwendiyan yê Partî Dîmokratî Kurdistanî-Îran re

## Rêzdar Mihemed Salih Qadrî



Hevpeyvîn: Hemze Hemkî - Malpera WESHAN

*6/Gelawêj/2016*

***- Rastiya danûstandina sazûmana Îranê bi kurdan re çî ye, û Kurdan tu maf li wir bi dest xistine?***

Eger em bixwazin rastiya helwesta sazûmana Îranê li derbara …….3

## Nameyeke Sersaxiyê



***Hevalên partiya yekîtî ya Kurd li Sûriyê …***

Bi dilêş û xemgînî nûçeya koçbarkirina dost û birayê me yê hêja Îsma'il Hemê gihaye me.

Ji ber endam û hevalên partiya me ve, em sersaxiyê ji hemî heval, hogir û malbata rehmetiyê hêja Îsma'il Hemê re dixwazin.

Çûna Îsma'il Ĥemê di qonaxeke weha de, ziyana tevgera siyasî ya gelê Kurd li Sûriyê û ya me hemiyan bû.

*Bila hûn xweş bin. Serê we sax be.*

**Birayê we Mihyedîn Şêx Allî**

**Sekretêrê Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

*Efrîn 18.08.2016 an*

**Şêx AlÎ ... Dûmahîk**

wan dirêj bike".

Şêx Alî di heman mijarî de got:"Ji ber van sedeman em wek partiya yekîtiya demokirat a kurd li sûriyê destêwerdan Tirkiyê şermezar dikin"

Derbarê rêkeftinên Amerîkî- Tirkî - Serkretrê partiya El-wehdê Şêx AlÎ wiha şîrove kir: "Lihevkirina Turkiyê û Emerîka di derbareyî kirîza sûriyê de ne lihevkirineke stratîjîk e, û Turkiyê di şerê li dijî cîhadiyên îslamîst de ne cidî ye ji ber ku di destên me de rapor hene, ew rapor û agahî didin xuyakirin ku bi hezaran ji kadro û xelekên Daîş, Nosra û partiya islamiya Tirkistanî li ser erdê Tirkiyê dijîn û tên perwerdekirin, pişt re derbasî erdê sûriyê dibin". *Ji qasioun.net - Çarşem 31 Tebax 2016*

**Ji Kurdan ... Dûmahîk**

têroristî de bi nav dike. Ew jî tê wê wateyê ku ew û destlata wî, dîsa naxwazin rastiyan bibîne û kor bûne, û çi dema ku pirs tê ser gelê Kurd, li kû derê dibe bila bibe, ew wan bi têror bi nav dike û naxwazin rastiyê bibînin. Û eger kurdek li dawiya cîhanê jî bi ser keve, Erdoxan û alîgirên wî, riya xwe şaş dikin, û li dijî vîna gelê Kurd û pirojeyên aştî û demokratiyê disekinin, û eger kani bin bi pelîdên/Iblîs mîna Daiş re re jî bibin heval û sînorên dewltan jî derbas bikin, û bibin dagîrker jî wê bikin.

Lêbelê li bervajî helwesta destlata Tirkiyê, roja îro hemî alî û dewletên ku bi pirsa Sûryê re têkildar in, di serî de jî Emerîka û Rûsya, ew hemî hêzên kurdî wek hêzên dijetêror dibînin, û doza kurdî jî mafdar û rewa nas dikin, û nêrîna destlata Anqerê a li dijî Kurdan jî rast nabînin. Ji bilî ku, ji hemî raya cîhanî re jî hatiye naskirin, ku hêza ku îjdil li dij têrora rêxistian Daişê şer dike Hêza Sûrya Demokrat û hêza kurdî ye, û têdigihên jî ku destêwrdana hêzên tirkî di bakurê Sûryê de, ne ji bo şerê rêxistina Daişê ye, lê ji bo pirsa Kurd e, ji ber ku Daiş ji bêtirî sê salan de li ser sînorê Tirkiyê ye, û ji hemî alî û dewletan ve diyar bûye, ku têkliyên wan bi hev re heye,.

Di rastiyê de, tirsa ku Kurdên Sûryê mafê xwe bi dest bixin, û li herêma Bakurê Sûryê bibin destladar, pişt li Tirkiyê şikandiye, ew wê guhertinê, bi neheqî, wek metirsiyekê li ser ewlehiya xwe ya netewî dibîne!, jixwe, her du sazûmanên Şam û Tehranê jî di wê helwestê de bi Tirkiyê re hevpar in, loma jî em dibînin, ku çawa berteka wan li hember hêrişa hêzên Tirkî û ketîbeyên tundrew, li ser Bakurê Sûriyê, nerm û pîvayî ye, wekî ku wan berê pê zanî, û jê razî ne. Jixwe, helwestên Emerîka û Rûsiya jî, di vê babetê de durû û mijokî ne, û gelek xatirzanîn ji bo Tirkiyê tê de heye.

Eger Tirkiyê dibîne, berî ku tirêna aştiyê li Sûryê dikeve rê, fergona Kurdan jê bibire, ew di wê yekê de pir şaş diçe, û dê bi ser nekeve. Ji ber ku dîroka xebata tevgera Kurdî li Sûryê, û keda bi hezaran lawên gelên kurd, û xwîna bi hezaran pakrewan û têkoşeran di nava rêzên Yekîneyên Parastina Gel de, bi saya wan hemiyan, doza kurdî li Sûryê derbas asteke cîhanî bûye, û bûye hejmareke bingehîn di qeyrana Sûryê û çareserkirina wê de, û tukes nikane mafên gelê Kurd pişguh û bincil bike.

Lêbelê di gel hemî tişt û pêşketinên erênî, hîn jî doza kurdî li Sûryê di nava xeterên mezin de ye, û ta ku rê li ber pêlanên têkbirina wê were girtin, zor giring û pir pêwîst e, ku katekê pêş de, hemî hêzên me yên siyasî bibine yek dest û yek helwest.



" Darvekirina çalakvanan li Îranê berdewame "

**Hevpyvîneke ... Dûmahîk**

Kurdan û pêkhateyên Îranê yên din nas bikin, gerek e em li destûrê Komara Îranê vegerin, emê bibînin, ne di destûr, ne di hiş raman Welî El Feqîh, ne jî di stratîciya Komara Îslamî de mafek bi taybetî Kurdan û pêkhateyên netewî û olî yên din heye. Tu mafên demokratîk, yan civakî yan çandeyî û tiştên din jî tu ne ne, û çi rêçek an çandek li derveyî hiş û nêrîna Welî El Feqîh hebe, wek neyar û dijmin lê tê nêrîn, û gerek e were dûrxistin û tunekirin. Ji ber wê, û li gora wê hişweriyê, piştî ku Xumeynî li sala 1979an bû destlatdar, wî fetwa ĥelalkirina xwîn, namûs û malê Kurdan da. Lewma, eger ji dema ku Xumênî hat de, em li dîroka Komara Îslamî binêrin, em bibînin, ku bi hezaran Kurd hatine kuştin û xwîna wan winda bûye, û bi dehan gund hatine wêrankirin, ji bilî setema ku li ser pêkhateyên din jî dibe. Sazûmana Îranê, ne tenê setemê li pêkhateyên dewletê dike, ew destê xwe dirêj nava herêmê jî dike, û pirsgirêkan ji hemî dewletan re çêdike.

***- Daxwazên siyasî yên partiyên kurdî li Îranê çi ne, û daxwaza we wek (PDK) çî ye?***

Em wek PDKî, stratîciya ku ji despêkê de em li ser dimeşin, ew e, ku sazûmaneke demokrat û federal pêk bînin, di siya wê de hemî pêkhateyên dewletê mafên xwe bi dest bixin, û çarenûsa xwe di navçeyên xwe de pêk wînin, û li gora hebûna xwe mafê nûnertiyê jî di sazûman û destlatê de bi dest bixe. Û em kar dikin jî, daku kongirekî hevbeş bi hin pêkhateyan re, mîna Ereb, Bilûş, Azerî û Tirkman li dar bixin, û li ser daxwaz û stratîciyekê li hev bikin.

***- Pariya Jiyana Azad(PJAK) jî, mîna we û pêkhateyên din doza sazûmana federaliyê dikin, lê daxwazine wan en din hene ji yên we cuda ne?***

Wekî ku win zanin, PJAK baskê Partiya Karkerên Kurdistanê ye li Îranê, û ez li vir ne li derbara ku hêriş kesekî bikim e, lêbelê ew ji aliyê daxawz û straticiyê de ji me û ji pêkhateyên din jî cuda ne, ji ber ku ew bi têgeh û bîrdoza Netewa Demokratik bang dikin, û dewlet û ramana netewî napejrînin.

***- Li roja îro, li nav Kurdên Îranê, partiya gelêrîtir, ku kolan di dest de ye, û xwedî cemawerê mezin e, kîjan e?***

Li Rojhilata Kurdistanê, du partiyên sereke, xwedî giranî û dîrokeke dirêj di xebatê de hene, yek ji wan partiya me ye, dîroka wî digihê heftê salî ji xebat û têkoşînê, ji bilî ku ew xwedî gelek nav, kesayetî û navnîşanên niştmanperwerî yên mezin e, mîna Pakrewên nemir Qadî Mihemed, Ebdirehman Qasimlo, Sadiq Şerfkendî. Ew partiyekî gelêrî î mezin e, li sala 1980yî, wî %80 ji dengê Kurdên Îranê bi dest xistin, lê sazûmana Îranê nehîşt nûnerên me têkevin Perlemanê. Û di bîranîna pakrewanbûna Dr.Qasimlo de, û digel fişara Asayişî ya tund, dîsa jî cemawerê me û gelê Kurdistana Îranê, li banga me xwedî derket û bi hezaran derketin kolanan, ev jî şaneke dine li ser gelêrtiya partiya me.

Partiya din jî Komele ye, ew jî xwedî dîrokekê ji xebat û niştmaniyê, em ji bo bidestxistina mafê gelê Kurd, ligel wî di hevbendî û lihevkirineke stratîcî de ne, û lidarxistina ``Kongira Pêkhateyên Îranê`` jî doz dikin.

***- Ji aliyê leşgerî û gelêrî de, navçeya ku partiyên kurdî destê xwe danîne ser, çawa parve dibin?***

Tu navçeyên rizgarî li Kurdistanê tu ne ne, ta em bêjin ku filan partî lê destlatdar e. Ji ber ku hemî dever di bin destê sazûmanê de ne. Partiyên kurdî jî bi dizî û veşartî karê xwe dikin. Li navçeyên bakurî ji kurdistana Îranê, ji ber çemê Arasê, ji sînorên Ezirbîcan û Ermîniya de, û ra navçeyên Îlam û Kermenşahê, liva kadir û ........

4

**Hevpyvîneke ... Dûmahîk**

pêşmergeyên PDKî lê heye, û tê de çalak in, û belkî hin partî jî li vir û li wir çalakiyan dikin, lê rastî mîna min ji te re got, bingeha tevger û çalakiyê li Kurdistana Îranê ya partiya me ye, ewê ku li dirêjiya heftê salî, bêtirî şeş hezar pakrewan dane, û di warê pêkanîna daxwaz û mafên netewî yên Kurdên Îranê de, xwedî nêrîna diyar û stratîciya naskirî ye, loma jî bawerî di navbera wî û gel de ava bûye, û li dora wî civîne.

***- Sedem çî ye, ku rola PDKî li van salên pêşîn bi şûn de çû bû, nemaze jî piştî kuştina E.Qasimlo?***

Bê guman, jidestdana sembol û rêberekî mîna Dr.Qasimlo, ji her çar beşên Kurdistanê re ziyan bû, ne tenê ji partiya me û ji Kurdistana Îranê re, lê ji tiştên ku pakrewan Qasimlo di nava partîyê danî bû, û bi cih anî, karê li ser bingeha rêbertiya komane ya hevbeş bû, ji ber wê jî, gava ku partî rêberekî xwe ji dest bide, hikariya li ser pêvajoya partiyê û pêşketina wî nake, û wilo, dema ku ew hate şehîdkirin, cîgirê wî Dr. Sadiq Şerefkendî partî bi rê ve bir, û di riya xebatê de çû, ta piştî sê salan sazûmana Îranê ew jî bi xinanî şehîd kir, û ji wê çaxê û ta niha, û li bervajî gotinên ku dijmin belav dike, û dibêje ku partî winda bûye, û çalakiyên xwe rawestîne, roj li dû rojê alîgir û cemawerê wî fere dibe. Û ya rast, kerbûna dengê partî piştî Qasimlo û Şerfkendî, ne bi lawaziya partiyê ve girêdayî bû, ew bi nîr û mercên ku me bi Başûrê Kurdistanê ve girêdide ve girêdayî bû, me berjewendiya netewî ya bilind di ser ya partî re girt, li ber roniya wê jî, partî jî biryar da, ku çalakiya xwe ên leşgerî rawestîne, û wê yekê kir, ku karê me li Kurdistana Îranê berçav nebe. Û win dibînin, li vê dema dawî, me dîsa dest bi çalakiyên xwe kir, û win dibînin çawa û çiqasê hikariya karê ku me kir li raya cîhanî bûye, û çawa rewş tevgerî.

***- Hin rapor dibêjin, ku PJAK partiya hera bi hêz e li Kurdistana Îranê, û bingeheke wî ye gelêrî ye fere heye, ma ta kîjan radeyê ew rast e?***

Em wek PDKî bi pirerengiyê bawer dikin, û bilî xwe dipejrînin, û her partî û tevgereke ku eydiyolociyeke xwe din hebe, û ji ya me cuda be, û li gora daxwazên cemawer û li dijî sazûmana Îranê kar dike, em rêzê jê re digirin, û xebata wî hêja dibînin, û di encamê de gel û sandiqên hilbijartinê xuya dikin, ku kî xurtir û gelêrîtir e.

***- Nakokiyên we yên berz bi PJAK re çi ne, û win çawa li karê wê li Îranê dinêrin?***

Tu nakokiyên me bi aliyekî bi xwe re tu ne ne, û di nava wan de jî PJAK, û wekî ku nas e PJAK baskek e ji PKK, û siyaset û stratîciya ku li ser dimeşin jî diyar e, û wilo siyaseta em jî pê bwer dikin û li ser dimeşin naskirî ye.

***- Berztirîn nakokiyên we bi PJAK re çi ne û win çawa li xebata wan li Îranê dinêrin?***

Li derbara têkliya bi PKK re, tu nakokiyên me bi tu aliyan re tu ne ne, di nav wan de PJAK jî. Û wekî ku nas e, ew baskê PKK ye, û têkliyên wî ên yekser û fermî pê re hene. Û stratîcî û siyaseta ku li ser dimeşin jî diyar e, û siyaseta ku em jî li ser dimeşin û pê bawer dikin diyar e. Em li ser xalên ku me digihîne hev, û li ser li hev dikin kar dikin, ew xalên ku dikevin xizmeta Kurd û Kurdistanê. Cudawazî ji hêla ramanê de jî tiştekî normal e, û nabe eger ji bo nakokiyê, û ra ku pirsgirêk li ser tiştine meydanî jî hebin, emê bi wan re bin, û arîkariyê bidin wan, û ji bo çi nakokiyê jî, û çaeresrkirina wan, emê li PKK vegerin.

***- Wekî ku roja îro, sazûmana Sûryê bi şêweyekî endamkî bi sazûmana Îranê ve hatiye girêdan, ma hikariya nêzîkbûna Partiya Yekîtiya Demokratî PYD ji Sûryê ve, di warê rawestandina şerê PJAK li dijî sazûmana Îranê heye?***

Wekî ku hatiye nasîn, herêm bûye du tewareyên Miĥwer bingehîn, tewarê Şî`e û tewarên Sune, û her yek ji wan jî xwe bi tewareke xwe e navdewletî ve girêdide, mixabin hêz û aliyên kurdî jî ketine lîstika wan tewaran, PKK derbas nav tewara Şî`e bûye, ku Îran, Sûrye, Libana û ta digihî Yemenê tê de ne, û ew bi Rûsya ve girêdayî ye, û hin partiyên Kurdistana Îraqê jî ketine tewara Sune, ku ji Siûdiye, Qeter, Tirkiye û dewletine Erebî yen din pêk tê, ew jî bi Emerîka ve girêdayî ne.

Lêbelê, derbasbûna nava wan tewaran, li ser bingeha karê wan ji bo bidestxistina mafên kurdî, yan dûrketina wan ji wê ….. ⓫

# Li Qamişlo Dr. Nûrî Dêrsimî hate bibîranîn



Li roja Duşemê 24/8/2016 an, li ser vexwandina Desteya Sernivîser a rojnameya El Wehdê, bi boneya 43 saliya koçkirina xebatkarê Kurd ê navdar Dr.Nûrî Dêrsimî, ahengek li navenda Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûryê hate li darxistin.

Aheng; bi kêlîkeke bêdeng li ser giyanê parewanên Kurd û Kurdisanê dest pê kir. Paşê, nivîskaran (Konê Reş, Derwêşê Derwêş û Newafê Bişar) gotarên xwe xwendin, û peyama romanivîs û helbestvanê Kurd Riza Çolpanê Dêrsimî ku ji Australya şandibû jî hate xwendin.

Li jêr, em hin parçeyên bijarte ji gotarên nivîskaran digel peyama Birêz R.Çolapanê Dêrsimî diweşînin:

## Dr. Nûrî Dersimî

**Konê Reş**

Pêwist e ku mirov di govenda mêran de dîlanê bigerine, li gor bejin û bala wan, bejin û bala xwe bihejîne, û pîş û sazên wan ji gelê xwe re derîne.. Erê, êş û azarên wan şanî gelê xwe bide, berxwedan û pêdariya wan, mêranî, dilsozî û wefadariya wan ji xwendevanên zimanê xwe re raxîne.. Di rojên 10-11-12/02/2009an de, bi serdaneke taybet çûme Efrînê-Çiyayê Kurmênc daku pêzanînan li ser kurdên Êzdî, kom bikim. Di vê geşt û gerê de, çavên min bi gelek kesan ketin, bi gelek kesan re axifîm û pirsa gelek kesan û tiştan kir. Di nav re, min pirsa hin navdarên kurdan mîna Dr. Nûrî Dersmî jî kir.. Ewên ku xebat û bizav di ber kêşeya gelê me de kirine û malê xwe û canê xwe di rêka welatê birîndar de winda kirine.. Wiha ez li ber gora Nûrî Dersimî sekinîm û se boriya wî gelekî bala min kişand.

Dr. Nûrî Dersimî, yekî bingehîn bû ji lehengên serhildana Dersimê ya 1937an. Piştî têkçûna serhildanê û bidarvekirina bihiştî Seid Riza serokê serhildanê û her deh hevalên wî, Dr. Nûrî Dersimî ji neçarî xwe digihîne bajarê Helebê. Û wiha 35 salên xwe yên dawî li Helebê, di nav kurdên çiyayê Kurmênc de derbas kirin. Belê tevî xwînherikandina wek cobaran di serhildana Dersim de, ew ji desthilanîn neket û xwe ji ber neyartiya Tirko neda alî.. Tirko yê ku heval, dost û xizmên wî kuştin, sirgûn kirin û di zîvariyan de belavkirin.. Û herwiha li Sûriyê jî wek lebatkarekî aktîv ket nav refên welatparêzên Kurd, li kêleka Bedirxaniyan û hevalên wan sekinî û bi wan re kar û xebat di ber kurdewariyê de kir.. Û di sala 1952an de pirtûka xwe ya navdar bi navê: KURDISTAN TARIHINDE DERSIM, li Helebê çap kir, lê mixabin ku ji rex rijîme ve hat qedexekirin.*(Erêkirin ji pirtûka wî re hebû, lê belavkirina wê li Sûryê qedexe bû-Newroz).*

## Peyama Nivîskar û Romanivîsê Kurd

**Riza Colpanê Dêrsimî**

Dr. Nûrî Dersimî ji bo min şewq e, ronahîya rojê ye. Bi taybetî hosiya wî ya ji bo zarok, xort û keçên Kurd gelek-gelek girîng e û pir jî bi nerx û hêja ye. Ji bo hest û pejnên Kurdperwerîyê, ew mamosteyê mine yekem e. Ez bi pirtûka wî ya bi navê "Di dîroka Kurdistan da Dersim" li xwe hesîyame. Qet ji bîr nakim.

Li vir ez ji ew kesên …… 6

**Li Qamişlo ... Dûmahîk**

ku ji bo salvegera mirina Dr. Nûrî Dersimî dixwazim li cîyekî kom bibin û wî nemirê Kurdistanî jî bîrbînin, ji hemûyan ra silavên biratî rêdikim, li ber gîyana Dr. Nûrî Dersimî serê xwe ditewînin "Axa wî zêde, rama xweza li ser axa wî kêm nebe" dibêjim.

Australya - Sydney.
19.08.2016

## Hîna Jî Dengê Hewara Nûrî Dêrsimî Bilind e.

Derwêşê Xalib

…Heger em vê pirsê ji xwe bikin: Çima Nûrî Dêrsimî xwest cenazeya wî di ber konsuliya tirkî re bibuhure ?. Bêguman nexwest ji wan re bibêje "Bela xwe vekin ,va ez mirim ", lê xwest nameyeke din bigihîne dewleta Tirkiyê, diyar e, şêweyê Nûrî Dêrsimî bi kar anî bi jîr û jêhatî bû, "jîriya rojhilat " bû, jîriya rojhilat mîna mamikên kurdî ye, hin kirin yan gotin hêmaya têgeheke din in, jîrî pêwist e ku mirov têbigihê.

... Nûrî Dêrsimî di wesyeta xwe de gotibû ku pirtûka wî ya bi navê (Dêrsim Di Dîroka Kurdistanê De) û mistek axa dêrsimê pê re veşêrin. Ev jî pendeke ji xortên kurdan re ye, ku welatparêzî û zanîn bingehên serkeftinê ne.

Nûrî Dêrsimî hemû amadekariyên xwe kiribûn, ku xebata wî piştî mirinê jî wê berdewam be û bibandor be.

Ev sedem bû ku Nûrî Dêrsimî xwest cenzê wî di ber konsulxaneya tirkî re derbas be mîna ku bibêje (**Ez rikberê we me, li cihekî din, û li mezargeha Henan xebata xwe berdewam bikim...**.).

## Bîranîna Koçkirina xebatkar û rewşenbîrê Kurd Dr.Nûrî Dêrsimî

Newafê Bişar

Sala 1952an, bi sernava"Dîroka Kurdistanê-Dêrsim", li Helebê, ew pirtûkekê çap û belav dike, tê de, tewan û kiryarên hovane yên dewleta Romê ya ku 222 gundên Kurdan wêran kirin û bêtirî 15000 Kurd, ji zarok, jin, pîr û kal kuştine, belge kirine.


Gelek Kurdên Kurdax, Heleb û Cizîrê li mala wî civînên Kurdewariyê girêdane, li ser destên wî fêrî zimanê Kurdî bûn, ji kaniya zanîn û ezmûna wî ya Kûr sûd wergirtin. Berî ku ew koça dawîn bike, wî sala 1963an gora xwe û hevjîna xwe li rex hev, li goristana "Henan", ya nêzîkî bajarê Efrînê ye kolan, û ev rista jêrîn li ser nivîsand:

**Li ser vê riya dijwar, min jî kire pir hawar**

**Da ji bo we rojekê, dinya bibe gulbihar!.**

Roja 22ê Tebaxa 1973an, li Helebê, dilê vî lehengê Kurd radiweste, çavên xwe digire, û ew li Şêx Seîd, Seyid Riza, pêşewa Qazî Mihemed û hemû navdarên Kurdan dibe mêvan.

Bi navê Kovara **PIRS** û Weşana **NEWROZ**, ez spasiya beşdarbûna we dikim, û bi navê we hemiyan, destek gul û kulîlkên rengîn, li ber serê têkoşer **Nûrî Dêrsimî** datînim û bi rêzgirtin jê re dibêjim: Belê ez benî, bi saya xebata we û mezinên me, bi saya hevgirtina gelê me, bêguman e, ku ji bo me dê rojek were û "dinya bibe gulbihar!"...



# Hin Şaşiyên Giştî li Cem Hin Nivîskaran

**Dilovanê Deştê**

Ziman yek ji hêmanên bingehîn û sereke ye, ku ne tenê dîrok û çanda miletan, lêbelê netewayetiya wan bi xwe jî diparêzê. Herwiha, vejandin û nûjenkirina zimên jî li gorî rewşa şaristanî ya her miletekî, seranserî qonaxên dîroka wî pêwîstiyeke serpişk û pir girîng e. Hêjayî gotinê ye ku zimanekî wisa wê xurt û hevgirtî be, nexasim ku li gorî rêzik û rêbazine rêzimaneke birêkûpêk û lihevhatî avakirî be.

Rast e, hebûna zar û devokan dewlemendî û zengîniya zimên bi xwe ne, lê di heman demê de jî ew hin şaşîtiyan, çi nivîskî û çi devokî di nav axaftin yan nivîsandinê de peyda dikin. Ev şaşîtî hin qelsbûn û lawaziyê ji zimên re tênin. Niha ez dê çend nimûneyan ji van şaşîtiyan bêjim û şirove bikim.

1- Silavkirin: Seydayê nemir Cigerxwîn di helbasteke xwe de dibêjê: "Silav li sifra hazir e". Vê hevokê ji berî ................⓫

---

**Li Qamişlo ... Dûmahîk**

## Dem li benda me namîne

**Nûşîn Bêcirmanî**

Partiya yekemîn a kurd li Sûriyê di 1957ê de hate damezrandin, partiyên ku parçe bûn, ji destpêka parçebûnê û ta îro, kêm, zêde, biçûk, mezin, çalak an xiloxavî, ji ber gelek egeran, tev li ber ezmûneke dîrokî ne. Di nerîna min de, ew eger jî ev in:

1- Endamên partiyan, ne ew endamê salên 60î û 70yî ne; ne ji aliyê xwendin û zanînê, û ne ji hêla pêşketina tevaya aliyên jiyanê ve, eger serkirdeyên partiyên kurdî di vê xeyalê de bin, wê hîngê tevgera kurdî ber bi têkçûnê ve diçê .

2- Guhertin , nîşana herî sereke ya vê demê ye. Eger em weke berê bimînin, an jî mejiyê serkirdeyên kurd, weke Cebsînê lê were û guhertinan nepijirîne, ji xwe emê li paş demê bimînin.

3- Derfetên siyasî û leşkerî yên li ber miletê me ne, bê guman dê ta dawî berdewam nebin, wê lomê gerek e em ji dest xwe bernedin û berjewendiyên taybet û partiyetî di ser yê giştiyane re, negirin.


Di gel van egeran, mixabin, partî û çarçewên me li hev nakin, li bervajî wilo bê sînor şerê hev dikin... Mixabin siyasetmedariya me bûye bendîtiya berê, (Mehmûdkî û Etmankî) bi xwe ye; her partiyek an çarçewek ya din weke neyar dihijmêre, û bi çavsorî li wan dinerê, bi şev û roj kar dikin da yê din tawanbar bikin û ha..ha li ser ragihandinê belav bikin, da ew bi tenê (weke xewna dibîne) ji kurdayetiyê re bibê nîşan û simbol..... Di encamê de dijminên doza kurd bi tenê sûdê jê werdigrin...!

Ta kengî, ev nakokî û piroblem wê di navbera partî û çarçewên kurdî de hebin?.Ta çi qonaxê gelê kurd wê bendewarê lihevkirina partî û çarçewên me yên siyasî be?. Sed mixabin ku van çarçewên me berê xwe dane hev û pişta xwe dane neyarên doza me, bi hemû hêz û hunera xwe li dij hev, li ser ragihandinê şer dikin, hêvî û morala gelê xwe di vê qonaxa ku neyarê çekadar û devbixwîn li ber deriyê me ye, ji me ne dûr e.

Eger em kurdewariyê bikin, pêdiviye hemû hêz li gor hene, beşdariyê di diyalog û guftugoyên ku di rojên bê de bibin, bikin – ne weke hin siyasetmedar, mixabin dibêjin-divê ew diyalog tenê du alî bin. Di vî warî de, nimûneya neyînî ya birayên me li başûrê welêt li ber çavan e.

Bi diyalogeke demokratî, pirsgirêkên me çareser dibin, giring e em zanibin, tevaya rastiyê ne li nik aliyekî bi tenê ye, û ne aliyê din bi tevaya xwe şaş e, na.....Hin li vir û hin li wir heye, ev rastiyeke, tu kes nikare çavên xwe jê bigre. Dem li benda me namîne, derfetên weha jî her roj û meh nayên.... Bila Kurdayetî, ne partiyetî armanca me ya sereke be, partî û çarçew diçin û tên, lê gelê kurd wê her û her li ser vê xaka pîroz bimîne.

# SERSAXÎ…



**Rêzdar … Êla Îbrahîm Paşayê Milî**

Em we hemiyan silav dikin, ji bo jidestana mamoste Ebdilîlahê Paşê ji dilûcan de serê we xweş dikin. Bi rastî, goçkirina wî, ji me û ji hemî sûryan re, Kurd û Ereb, Misliman û File, ziyanek mezin bû.

Di van bîst salên dawî de, me ew ji nêzîk ve nas kir… Ew xwendevanekî pir baş, diltenik û comerd bû, bi êşeka gelê xwe hestewar dibû, ji lêkolînê hez dikir, û dixwast aştî û jiyana pêkve biparêze.

Di vê dema dijawar de, we lawê xwe yê payebilind û dostê me yê hêja ji dest da, wî hergav ji gelê xwe hez dikir, û bi dilsozî zanîn û nerxên mirovatiê belav dikirin.

Careke din em ji malbat, meriv û dostên wî re serweşiyê dixwazin, û sebir û hêminyê ji we re hêvî dikin.

*Efrîn 01.09.2016 an*

**Birayê we**

**Mihidîn Şêx Allî**

**Sekretêr Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûryê**




# KURD CANGORIYÊN HEV IN

**Îlham Osman**

Mirovahî dipirpite, mirovan mirovahî afrandiye.. şaristanî ava kiriye.. bi hişmendiya xwe gerdûn bi pêş xistiye.. zagon û ol bi rêve birine.. civakbûyîn çê kiriye.. avahiyên bilind ta sîngê azmanan rakirine.. zemîn bûye gundekî biçûk.. pêdiviyên jiyanê hêsan kirine.. lêêêê hezar mixabin!!!! Mirovan mirovahî bi destên xwe di gora şer, pevçûn û talankirinê de spartine.. Ta qêrîna perwînan li ber şûrê kîn û nijadperestiyê tê birîn, hêsira dayîkên bêzar li ser termên şêrên xwe weseka xatirxwestinê dinûse, di sîngê ciwanên me de jîn dimire, û ta gilêza berjwendiyên qirêj bi devê dijminên hovan dikeve, di heman demê de, MIROVAHÎ can dide û ji wateya rast tê şoştin... Bila Encûmena Ewlehiyê tabloya xwe biguhêre, û bi navê encûmena tevliheviyê xwe binasîne.. bila dezgehên mafê zarok, jin û kalemêran kerta sor rakin û hêviyên siberojê di gola xwînê de biherikînin.. bila mafê VÎTO karê xwe berdewam bike û dengê mirovahiyê kilît bike.. bila dirûşmên weke dad, azadî, aştîxwezî û demoqrasî di lîsta bêjeyên derasayiyê Xurafê de ji bîr bikin.. SERKIRDENO!! RÊVEBIRINO!! KURDINO!! Rawestin.. di kuştina mirovahiyê de dîdevan.. bi sozên derewîn rasteqînan meguhêrin.. hêlehêla biratiyê di carçovaya lihevhatinê de bihelînin.. bila gotina: Kurd gurê hev du ne, ji dîrokê were avêtin, bila berevajî wê bêjin: Na, KURD CANGORIYÊN HEV IN.



**Xelata Aştî ... Dûmahîk**

ya cîhanî û PFIOyê jî tê kirin û dîtin, û di rûpela dîroka xebata gelê Kurdistanê û lawê wî yê hêja Selahdîn de tê terixandin.

Rêxistina PFIOyê li 8/8/2008an hatiye damezrandin û salê mirovekî vedibêjere û xelata xwe ya salane didê. Pîroz be ji lawê gelê Kurdistanê re û ji hemî gelên cihanê, û ji mirovên aştîxwaz û dostên rizgariya gelan re.

# Berxwedan jiyan e

Nazdar Hesen



Di dîrokê de, gelê me yê Kurd rastî pir astengî, zilim, zordarî, talankirin û qirkirinê hatiye, tevî wê jî, dijmin û neyaran nikarîn gelê me ji sincên mirovahiyê yên resen bi dûr xista, her tim ew wek miletekî aştîxwaz, mirovhez û azadîhez dihate nasîn, herdem gazî li biratî û wekheviyê dikir, lê mixabin, pir caran, ew bi nijadperestî û xapandinê dihate redkirin, ji ber vê yekê, gelê me bi gelê berxwedaniyê tête nasîns, û di vî warî de jî hêja ye em gotina berxwedêrê gewre yê pêşeng di xebata tevgera siyasî ya Kurdî de li Sûriyê Apo Osman Sebirî bi bîr bînin, dema got : Ez xwe danînim ji bo sitem û zorê, gava bi rûmet herim gorê, hêja ye bibim lawê Kurdistanê. Erê! Gelê me tucarî sitem û zordarî nedipejirandin, û tu wate ji jiyana bindestiyê re nedidît, û ji bo xaka welatê xwe biparêze û mafên xwe yên rewa wergire, û daxwaza wî ku di jiyaneke azad û rûmet de bijî, giha bû baweriya ku berxwedanî ji gelê bindest re jiyan e, hebûn û berdewamiya wê ye, lewre, wî berxwedaniyeke rastîn dikir, bi hemû hêzên xwe xebat û têkoşîn dikir, û bi pêdarî li hember hemû kiriyarên karbidestên dagîrker disekinî, û li dijî wan şer dikir û gelek qurbanî didan, û ta niha jî di vê riya jiyanê de berdewam e.

Roj bi roj lehenigiya cangoriyên şervanên me, destanekê bi tîpên zêrîn di dîrokê de xêz dikin û vedengên wan cîhanê dihejînin .Erê di saya berxwedaniyê de jiyana me Kurdan şîn û geş dibe, û doza me her û her pêşve diçe û bi ser dikeve.

---

# Kulîlkên Guldanê

Rabah Ibrahîm

Germahiya havînê rojên xwe dihûnandin, derbasî payîza westiyayî dibûn, xemla kulîlkan û pelên daran hêdî hêdî zer vedugeriyan û diweşîn, ji barê giran westiya bûn. Refên meqesokan berê xwe didan koçberiyê li hêviya berbangeke nû bûn, lê ez jî li dawiya rojên xwe li hêviya şiqindana dara jîna xwe bûm.

Di sibeheke xunavî de, perwanekê mizgîn bi jîndara rihekî biçûk di nav pêçeka rengegulî de dida min, dilê min ji kêfa re serxweş diket, şev û rojên min li ber dergûşa biçûk derbas dibûn, bi lorîn û awazan xem û xeyalên xwe direvandin, roj bi roj li ber çavên min mezin dibû, di guldana mala min de geş dibû, xewnên payî ji paşerojê re min tep dikirin.

Lê ji nişka ve, di rojeke dînok de, lehiyek bi ser me de hat, ter û hişk dan ber xwe, gupik û kulîlkên guldana min belav kirin, ez matmayî mam, mîna bazirganekî ku mal û mewalên xwe tev daye der, rojên hingivîn tehil geriyan, xewnên salan di nav pêlên babelîskê de wenda dibûn, wek kevokeke birîndar di hêlîna xwe de dinalî. Ezê bimînim û bimînim çavên xwe bi hêviyê kildim, her ku kela dilê min rabe, ezê werîsekî ji tîrêjên rojê birêsim, belkî delxa dilê min bişkê. Xuya ye ku feleka xinan ji min re qedereke rengereşî dirist. Ma gelo eger dilê dayikê bişkê çare wê çi be?!.

# RÊWÊTÎ

*Vejîna Kurd*

Gurzek hesret..
baxek hêviyên stewr..
rûpelên çîrokeke bêzar..
destarê xeman
li bêdera sîngê min digerînin
kon û sîtava êşan
bi ser dawa demê ya qulqulî de berdidin.
Di dilê min de
birîneke şeşsalî daxife
pişta sibehên ku
helbestên talankirinê dihûnin
û hawaran
li pişta kêlîkan sîwar dikin, xûz dike.
Rêwî me….
yan penaber im..
Gavek li pêş..
yek li paş
çentê min bi rondikên sînoran
hawara çiya û newalan mişt e
di destên min de..
tenê nêrgizeke çelmisî..
mistek ax..
û hin hêsirên çemê Efrînê .
Li pêlên jînê siwar im,
di deryaya penaberiyê de
melevaneke hestfiroş im
û bi tîpên jibîrkirinê
avdasa man û nemanê dikim.
Belê.. penaber im!!
Di tenûra hestên min de pizotên bêriyê
û sewda xaka ku di xwînê de digevize
pife terafa vînê dikin.
Di xewnên min de
zincîra bîranînine biskqusandî
û giriyê dayika min
dema xatirxwestinê giyanê min
di xaliya jînê de noq dikin.
Çi bêjim?!! Çîrok dirêj e.
kolanên ku..
kilamên bêdengiyê distirên
gund û bajarên ku..
li ber kîna bomban hildiweşin
zarokên ku..
li termên dê û bavên xwe digerin?!!!
Çîrok dirêj e.
lê ne bêdawî ye.

# Çîroka zarokekî di cengê de

**Zozan Ebdo**

Ez biçûk, paqij û bêguneh bûm, loma ez bi her tiştî diramîm, min gelek hêvî li pey hev rêz dikirin; yê ku coşa min bidîta, wê xwe di buhişta zaroktiyeke hîna ji dunyayê tiştek nas nekiriye de pêjin bikira. Birastî jî ez zarokê hêviyan bûm, hemû dijwarî li ber şûrê vîna min diperpitîn. Min ji riyên dûr û armancên dijwar hez dikir; ji xwe riya min jî dûr... dûr bû, ger ne ji jiyanê, lê ji temenê zarokekî di temenê bêdengiyê de. Min destên xwe mîna basikên bazekî vekiribûn û pêxas dibeziyam... Dibeziyam… ji ber ku tu xemên min ji bilî serkeftin û bidestxistina armancan tunebûn. Erê ma gelo min ji kû ve zanî bû ku ew pêxasiya min, ew xwîdana eniyê min, ew bişirînên rûyê min, wê min bixapînin?!! Ma ew jî gunehek e?? Ma gunehek e ez ciwaniya umrê xwe di cengê de winda bikim?!! Ma min çi kiriye da ku tu sîwan armancên min ji barana qurşînên çeteyî ziwa nehêlin?!! Ma gunehê min e, ez temenê jiyanê bidim?? Ey gerdûn...ey cîhan... ey afrînerên ku di teşeya mirovan de hatine xulqandin... qêrîna giyana min û hezarên weke min; yên windabûyî, yên penaber û yên laşên wan bi mehan li erdê di nav lingê dêwan de mane...



Yên mirin berî ku bijîn... Ma qet negihîşt guhê we?!! Dengê me ji her dengî bilintir bû.. lê heyf û sed heyf ger her tiştekî olan veda ji bilî dengê me!!! Û çima? kesek bersivê nizane!! A niha yên dibêjin jiyan paqij e, ka ji min re bêjin win li kîjan seyrangehê ne, da ku ez bêm gel we û bîra xwe ji xeyalên Bekoyê Ewan rizgar bikim!! Yên ku ji despêka despêkê de mirine, win dikarin sond bixwin ku xelasa we ji jiyanê ne nikarbûnek bû?!! Yên ku dikin bi rojbûna min şah bibin û nizanin kengî ji dayîk bûme?? Kerem bikin; win dikarin her rojekê û her kêliyekê bi boneya cejina zayîna mirina zaroktiya min ahengan li dar bixin!! Ji ber ku ez nema ez im... Ez nema zarok mame... Çimkî; ji wê rojê de hîngê li ser sînga welatê min şer û pevçûn niştecih bûne , vê re zarokatiya min bi dawî bû... Êdî ez bûm şervan.... û min li şûna lîstoka xwe li ser milên xwe tiving Hilda.

**Hin Şaşiyên ... Dûmahîk**

nemir Cigerxwîn jî cihê xwe di mêjû, mejî û kevnetora Kurdî de baş girtiye. Ew ta îro roj tê bikaranîn da ku guhertina di helwestekê yan baweriyekê de dibe li ber çavan deyne. Lê li derveyî bikaranîna vê pendê, îro hin Kurd dibêjin: "Min silav kire filankes". Li gor vî awayî, divê em bêjin: "Dilo silav kire civatê", yan "Siyamend silav kire Memo". Ev şêweyê bikaranînê şaş e. Nimûneyeke dî: "Silavê lê'bkin/lê bikin" ji ala Kurdî re tê gotin.

2- Piraniya nivîskar û zimanzanan ji bo diyarkirina rojekê, mehekê, salakê... bi awayekî şaş nîşana gelejimariyê bi dawiya wê dîrokê ve dikin. Nimûne: (di roja 5an de..., di sala 1988an de..., di meha 9an de...) . Ezê du sedemên şaşîtiya vî şêweyî bênim ziman:

A- Em nîşana/veqetandeka yekejimariyê bi dawiya bêjeyên (roj, sal, meh...) ve dikin, û ev dide xuyakirin ku em li ser yek roj, yek sal, ye meh... daxivin. Ma çawa emê (-an)ê bi dawiya hejmara demê ve bikin? Ez dibêjim, ev qet nabe! Di vê derbarê de, ya rast û durust ku em bêjin: (di roja 5ê de..., di sala 1988ê de..., di meha 9ê de...).

B- Ka em van her du hevokan beramberî hev bikin:

- Di 1988an de bi hezaran pakrewan bûn qurbanî.

- Di 1988ê de bi hezaran pakrewan bûn qurbanî.

Li gorî ku ez dibînim, hevoka pêşî dide xuyakirin ku van qurbaniyan seranserî 1988 salan jiyana xwe ji dest dane; û ev ne tenê şaşîtiyeke rêzimanê, lê belê şaşîtiyeke dîrokî ye jî. Di hevoka dî de, xweş diyar e ku ev qurbanî di yek salê de çûne ber dilovaniya Xwedê.

Di hin nivîsaran de hin lêker şaş têne nivîsîn, weke: "diaxive" û "diêşe". Herwekû em dizanin, hin zimanzanên zimanê Kurdî diyar kirine ku 2 tîpên bideng li pey hev nayên nivîsandin. Eger wiha werin jî, bêguman ya lawaz ji wan dikevê; û tîpa "i" di nav tîpên latînî yên zimanê Kurdî de lawaztirîn tîp e. Ji ber vê jî, ev tîpa "i" di bêjeyên wisa de hebe jî, ew ji wan dikevê. Ango, ev her du lêker weke nimûne wiha têne nivîsîn: (daxive, dêşe/têşe).

..... **Dûmahîk heye ......** ***((Nivîskar di ber nêrîna xwe berpirsyar e))***

---

**Hevpyvîneke ... Dûmahîk**

dimîne, nirxandina wan têkliyan jî li ser wan her du stûnan dimîne, ji ber wê jî, gerek e em zani bin, ku di çarçewa çi têkliyê, bi kîjan sazûman û tewarê re, em ji bîr nekin ku ew sazûman û teware, çiqas dirêj bike, dê biçe, û yê ku bimîne gel e. Loma jî, em hêvî dikin, di riya ew têkliyên ku wan hin sûd jê wergirtine re, ew têklîne di xizmeta berjewendiya doza kurdî de bimînin.

***- Hêza we ya leşgerî çiqase ye, ku kir win li hember sazûmana Îranê rabin?***

Bêguman, armanca me ne em li hember sazûmana Îranê bisekinin, çinkî ji aliyê hêzê û çekan ve, tu hevpîvan di navbera me de tu ne ye, lê ya giring ew e, ku em xwedî vîn in, û mafên xwe dixwazin, em vê vînê jî ji piştgiriya bi milyonan kesên Rojhilat werdigirin, hêza me hêza gel e, lê eger em ji aliyê çekan de raberiyekê di navbera xwe û sazûmana Îranê de çêkin, Îran bi sed carî ji me bi hêztir e, lê baweriya artêş û hêza wî bi sazûmanê tu ne ye, lê li bervajî wê, hêza me hêzeke şoreşgerî ye, û bi saya arîkariya Kurdistaniyan jê re, ew bûye xwedî baweriyeke bêdawî, û tirseke mezin xistiye dilê dijmin.

***- Ma vegera we ji bo çalakiyan, têkliya xwe bi nakokiya di navbera Dîmokratî Kurdistanî –Îraq û Tehranê de, û destêwerdana wê di karûbarên Herêmê û Îraqê de tu ne ye, û bi wê yekê win bûne kaxeteke fişarê, û PDK-Îraq we li dij Mileyan bi kar tîne?***

Nexêr! Ev gotina yekcar ji bîrûbawriya me ya siyasî dûr e, ji ber ku me ev biryara li gora dilxwaziya cemawerê xwe standiye, û eger em xwe bikin wek emraz û aliyek, û kesin me ji bo acîndeyên xwe bi kar bîne, gava ku ew alîna nakokiyên xwe bi Îranê re çareser bikin, wê hîngê şoreş û û çalakiyên me jî wê bi dawî bibin. Û dema ku li salên borî, me ji bo Kurdistana Îraqê, çalakî û têkoşîna xwe ya çekdarî li hember sazûmana Îranê rawestandin, wî kuştin, girtina kadirên me û gelê Kurd ranewstand. Dijmin vê gotinê dike û belav dike, û me bi alî û dewletan ve girêdide, û carina bi Barzanî û carekê jî bi Siûdiyê, Emerîka û Îsraîlê ve girêdide; ew jî bo kani be, raya giştî ya îranî bi aliyê xwe bixîne, û me jî ji hundir de bêşîne. Ji ber wê jî em raya giştî piştrast dikin, û dibêjin, ku ew gotinine ne rastin, j ber ku em partiyek in, vîn û biryara me di destê me de ye, ew jî bi daxawzî û vîna gelê me ve girêdayî ye.

***Wergerandin ji Erebî: Rozad Elî.***

# Hunermendê Efrînê ... Ebdirehman Umer xatirê xwe xwast

Dengê Siyamend û Xecê, Hawara Delêl û Edûlê, Gênc Osman û Naza Menên, hunermendê Koma Armanc, xebatkarê gelê Kurd, dengê Çiyayê Kurmênc yê ciwan, pir xweş û bilind, Cefakêş, dilpak, sincîbaş û destpak Hunermendê bi navûdeng û…, ev in hin salixên hunermendê gelê kurd yê navdar Edirehman Umer Bavê Selah ku li roja 13 meha Pûşberê/ Ĥezêranê li newxaşxana Avrîn, li bajarê Efrîn temenê xwe kir, jiyana xwe ji dest da û çû ser qedera xwe. Li roja 15 Tîrmehê, girseyek gel ji gundî, dost, heval û hogirên wî, darebesta wî ji nexwaşxanê derxistin û bi rêwresmeke balkêş birin gundê wî Gurda/Cindirês û li goristan gund veşartin.




Wekî ku tê zanîn, hunermend Ebdirehan ku bi n Bavê Selah dihat nasîn, ji damezrênerê Koma hunerî ya kurdî Armanc bû, ew koma li salên heştê ji sedsala borî hat avakirin û karê wê yê hunerî bi saya dengê Bavê Seleh û hevalên wî di bin nîrên û rewşên pir dijawr de kar û xebatek pir hêja ji hunera kurdî re bi tevahî û ji mûzîk û strana kurdî re bi taybetî kir, û hate naskirin û deng da, û komê. Hunermend ê nemir ji ber wê xebata xwe ji aliyê asayişên dewletê de hate girtin, û ta roja ketina xwe, pir zor û zehmetî jî di jiyana xwe de dît, lê dîsa jî, wî dest ji darê tembûra xwe û ji keziyên Edûlê û Delêl û Xeca Siyamedê Zilîfî berneda, û bi dengê xwe yê şêrîn û zîz kete nav rûpelên zêrîn yên hunera kurdî û ew nemirî kirin.

Hêjayê gotinê, ku hejmareke mezin ji dost û hevalên partiyan jî li rêwresên verêkirina henermendê gelê Kurd Bavê seleh amade bûn, di nav wan sekreterê Partiya Yekîtî Ya Demokrat a Kurd li Sûryê mamoste Mihidîn Şêx Allî jî made bû.

Birastî, mirina hunermedekî mezin di asta Bavê Seleh û hunera wî de, jidestdaneke pir mezi û bi êş bû ji huner, civak, dîrok û xebata gelê kurd re, mirov bawer nake, ku di demeke nêzîk de şûngirek jê re peyda bibe, û bi ew rengê resen û pir ciwan kelepûr, huner û stranê kurdî yên foliklorî û bi dengekî wilo ciwan û dilkêş derkeve meydanê û wê valahiyê dagire.

***Bila serê tevaya gelê kurd li seranserî Kurdistanê xweş be.***

## Xelata Aştî û Dostaniyê

**Acansên nûçeyan-** Xelata Rêxistina Aştî û Dostaniyê ya Navnetewî (PFIO) ya îsal 2016 ji para lawê gelê Kurd. Serokê hevbeş yê Partiya Gelên Demokratîk rêzdar Selahidîn Demirtaş bû. Û mîna mirovekî cîhanî û çalakber ji bo pêkanîn û parastina aştî û dostaniya di nav gelan de hate vebjartin. Bi rastî, rêzdar S.Demirtaş hergav doza aştiyê û biratiya gelên Tirkiyê dike, û ew û partiya xwe (HDP) jî, bi hemî kanînên xwe doza aştiyê û biratiyê dikin, û bi dilûcan û bi



rastgoyî di ber de dixebitin. Ev yeka li ber çavên raya giştî ...8